# Bultena heftane

# 29/4/2023

Email: **starmalper13@gmail.com**

Facebook:kongra star-مؤتمر ستار

Youtube: kongra.star22@gmail.com


**Nûçeyên ji cîhanê**

## [France 24: Jin di hilbijartinê de piştgirî nadin Erdogan](https://jinhaagency1.com/ku/rojane/france-24-jin-di-hilbijartine-de-pistgiri-nadin-erdogan-38633)

Li Tirkiyeyê hilbijartinên 14'ê Gulanê nêz dibin, çavên çapemeniya cîhanê li namzed û sozên wan e. Malpera nûçeyan a France 24 nûçeyek bi sernavê "Dema hilbijartin nêz dibin, jinên muhafazakar pişta xwe didin Erdogan" weşand.

https://jinhaagency1.com/ku/rojane/france-24-jin-di-hilbijartine-de-pistgiri-nadin-erdogan-38633

Çavkanî:JINHA


Conservative Turkish women are turning their backs on Erdogan ahead of vote

4 min

Turkey's May 14 elections are looking uncertain for Turkish President Recep Tayyip Erdogan amid a sluggish economy, young Turks less enamoured with the ruling AKP and an opposition that is finally united. Support from conservative women, usually a pillar of his voting base, is also looking less robust ahead of the vote. FRANCE 24 reports.

## [Dika herî mezin a Ewropayê perdeyên xwe ji bo 'Hêza jinên Şengalê' vedike](https://jinhaagency1.com/ku/cand-u-huner/dika-heri-mezin-a-ewropaye-perdeyen-xwe-ji-bo-heza-jinen-Sengale-vedike-38697)

Dika salona Zurih a Schausspielhaus a herî mezin a Ewropayê ku têd e sema, opera û şanî tên nîşandan, vê carê wê ji bo lîstika bi navê 'Hêza jinên Şengalê' ku mijara têkoşîna jinên Şengalê girt dest dê were vekirin.

https://jinhaagency1.com/ku/cand-u-huner/dika-heri-mezin-a-ewropaye-perdeyen-xwe-ji-bo-heza-jinen-Sengale-vedike-38697

Çavkanî:JINHA



# Rojnamevan Nîlûfer Hamedî Xelata Azadiya Penûsê wergirt

NAVENDA NÛÇEYAN - Cemiyeta Rojnamegerên Elman Xelata Azadiya Penûsê ya 2023'yan da rojnamegera girtî Nîlûfer Hamedî ya ku yekem car qetilkirina Jîna Emînî ragihand.

http://jinnews41.xyz/kr/HEMU-NUCE/content/view/210149

Çavkanî:JINNEWS



**Rojhilata navîn**

# [Helbestvan Nafîsa Zamanzade bi guman jiyana xwe ji dest da](https://jinhaagency1.com/ku/rojane/helbestvan-nafisa-zamanzade-bi-guman-jiyana-xwe-ji-dest-da-38641)

Helbestvan Nafîsa Zamanzade li bajarê Bandar Abbas a Îranê di şewata mala xwe de jiyana xwe ji dest da.

https://jinhaagency1.com/ku/rojane/helbestvan-nafisa-zamanzade-bi-guman-jiyana-xwe-ji-dest-da-38641

Çavkanî:JINHA



# **Dadgeha Evîn ya Îranê ji bo îfadeyê gazî 3 rojnamegeran kir**

Piştî serhildana “Jin, Jiyan, Azadî” dewleta Îranê zextên xwe li ser rojnamegeran zêde dike. Hat zanîn ku dadgeha Îranê ya Evîn ji bo îfadeyê gazî rojnameger Seîdê Şafiî, Mêhrnûş Zareyî Hanzakî û Nesîm Sultan Beîgî kiriye.

https://jinhaagency1.com/ku/rojane/dadgeha-evin-ya-Irane-ji-bo-ifadeye-gazi-3-rojnamegeran-kir-38640

Çavkanî:JINHA



## Derbarê 2 rojnamegerên jin ên Îranî de îdianame hatin amadekirin

Dezgeha Dadweriya Îranê derbarê 2 rojnamegerên jin ên girtî Niloufar Hamedi û Elaheh Mohammadi de îdianame amade kir. Di îdianameyê de bi îdiaya “propagandaya li dijî dewletê” hatin sûcdarkirin.

https://jinhaagency1.com/ku/rojane/derbare-2-rojnamegeren-jin-en-Irani-de-idianame-hatin-amadekirin-38638

Çavkanî:JINHA



## Jinên Tûnisî li dijî qetilkirina jinan meşiyan

Di van mehên dawî de li Tûnisê qetilkirinên jinan zêde bûne. Jinên Tûnisî li dijî zêdebûna qetlkirinên jinan û dewleta mêr û sîstema darazê helwest nîşan dan û bal kişandin ku ji ber pergal tundîtûjiyê normalîze dike rê li ber komkujiyan vedike.

https://jinhaagency1.com/ku/rojane/jinen-tunisi-li-diji-qetilkirina-jinan-mesiyan-38635

Çavkanî:JINHA



## [Jinên Başûrê Kurdistanê xwe ji bo 'Roja Sema' amade dikin](https://jinhaagency1.com/ku/rojane/sema-peyama-bi-zimane-bedene-ye-38629)

Li Başûrê Kurdistanê amadekariyên "Roja Sema ya Cîhanê" tê kirin. Semazan Solîn Dilpak diyar kir ku di komê de 13 jin hene û got, "Em dikarin bi rêya Semayê bi zimanê bedenê peyamên xwe bidin."

https://jinhaagency1.com/ku/rojane/sema-peyama-bi-zimane-bedene-ye-38629

Çavkanî:JINHA



## [Li Îranê mamoste û aktîvîstên kedê hatin girtin](https://jinhaagency1.com/ku/rojane/mamoste-u-aktivisten-kede-bi-awayeki-girseyi-hatin-girtin-38628)

Hêzên ewlehiyê bi ser mala Mihemed Habîbî de girtin û Reyhaneh Ansarinejad, Asal Mihemedî, Hirad Pîrbadaghî, Anîsha Asadolahî, Sarwenaz Ehmedî, Kamyar Fekoor, Hassan Îbrahîmî, Jaleh Rouhzad û Aldouz Hashemî jî di nav de mamoste û aktîvîstan girtin.

https://jinhaagency1.com/ku/rojane/mamoste-u-aktivisten-kede-bi-awayeki-girseyi-hatin-girtin-38628

Çavkanî:JINHA



## [Hemşîre dixwazin şert û mercên xebatê li Misrê biguhere](https://jinhaagency1.com/ku/ked-u-abori/hemsire-dixwazin-sert-u-mercen-xebate-li-misre-biguhere-38627)

Hemşîre li Misrê rastî tundiya devkî û fîzîkî tên. Rayedarê hemşîre yê Fransî Rida Abdel-Hadî bal kişand ser rewşa hemşîre û got ku sendîkayan têkoşîna pêwîst nedane.

https://jinhaagency1.com/ku/ked-u-abori/hemsire-dixwazin-sert-u-mercen-xebate-li-misre-biguhere-38627

Çavkanî:JINHA



## [Astengiyên li pêşiya jinên Filistînî ji bo hilbijartinan çi ne?](https://jinhaagency1.com/ku/siyaset/astengiyen-li-pesiya-jinen-filistini-ji-bo-hilbijartinan-ci-ne-38624)

Çalakvan Hemîde El-Tahrawî diyar kir ku beşdariya jinan di hilbijartinên desteyên navxweyî û guhertina zagona hilbijartinê û pergala kotayê dê ji bo pêkanîna prensîbên demokratîk û wekheviyê misoger bike.

https://jinhaagency1.com/ku/siyaset/astengiyen-li-pesiya-jinen-filistini-ji-bo-hilbijartinan-ci-ne-38624

Çavkanî:JINHA



## Komeleya Amal di her warî de piştgiriyê dide jinan

Komeleya Amal a Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi kar û xebatên xwe ve hem ji jinan re derfetê kar ava dike hem jî ji bo mafê jin û zarokan têdikoşe.

https://jinhaagency1.com/ku/civak-jiyan/komeleya-amal-di-her-wari-de-pistgiriye-dide-jinan-38621

Çavkanî:JINHA




# Jinên Rojhilatê Kurdistanê: Em ji bo parastina xwe şer dikin

Jinên li Rojhilatê Kurdistanê ji bo şermezarkirina êrîşên kîmyewî yên li ser dibistanan çalakiyên xwe didomînin. Jinên ku helwest nîşanî jehrîkirinê dan gotin: “Êdî em ne qurbanî ne em şervan in û ji bo parastina xwe şer dikin.”

https://jinhaagency1.com/ku/rojane/jinen-ji-rojhilate-kurdistane-em-ji-bo-parastina-xwe-ser-dikin-38645

çavkanî:JINHA



## [Tîma Futbolê ya Jinan a Amedsporê di fînala çaryek de ye](https://jinhaagency1.com/ku/rojane/tima-futbole-ya-jinan-a-amedspore-di-finala-caryek-de-ye-38646)

Tîma Futbolê ya Jinan a Amedsporê Zonguldak Ereğli Belediyespor 1-0 têk bir û derket fînala çaryek.

https://jinhaagency1.com/ku/rojane/tima-futbole-ya-jinan-a-amedspore-di-finala-caryek-de-ye-38646

Çavkanî:JINHA



## Jinên Afganî: Naskirina Talîbanê naskirina terorê ye

Jinên Afganî civîna ku li Dohayê ji aliyê YN yê vê were lidarxistin û vexwendina Talîbanê protesto kirin û diyarkirin ku ji bo pêşeroja xwe ew ê ferzkirinên Talîbanê qebûl nekin.

https://jinhaagency1.com/ku/rojane/jinen-afgani-naskirina-talibane-naskirina-terore-ye-38648

Çavkanî:JINHA



## Jinên Tûnisî: Divê hikûmet berpirsyariya komkujiyên jinan bigire

Jinên Tûnisî bi merasîma cenaze ya sembolîk ku organîze kirin, bal kişandin ser komkujiyên jinan. Jinên beşdarî çalakiyê bûn bang li hikûmetê kirin ku li hemberî tundiya li ser jinê bi berpirsyarî rabe.

https://jinhaagency1.com/ku/rojane/jinen-tunisi-dive-hikumet-berpirsyariya-komkujiyen-jinan-bigire-38651

Çavkanî:JINHA




## Bi sînemayê pirsgirêkên jinên Ereb dijîn vedibêje

Derhêner û senarîst Rîma Mahmoud li dijî sansur û zextan pirsgirêkên jinên Filistînê û Ereb bi sînemayê nîşan dide.

https://jinhaagency1.com/ku/cand-u-huner/bi-sinemaye-pirsgireken-jinen-ereb-dijin-vedibeje-38652

Çavkanî:JINHA



## ‘Naskirina Talîbanê li hember jinên Afganî suc e’

Jinên Afganî diyarkirin ku naskirina Talîbanê di qada nawnetewî de li hember wan suc û îxanet e, wê ev yek li welat bibe sedema binpêkirina mafê mirovan.

https://jinhaagency1.com/ku/rojane/naskirina-talibane-li-hember-jinen-afgani-suc-e-38653

Çavkanî:JINHA



## Rojnamegerên hatin binçavkirin anîn Enqereyê

Hevseroka Giştî ya DFG Dîcle Mûftûoglû û girtiyên din ên ku di çarçoveya lêpirsîna Serdozgeriya Komarê ya Enqereyê de li Amedê hatibûn binçavkirin, anîn Enqereyê.

https://jinhaagency1.com/ku/rojane/rojnamegeren-hatin-bincavkirin-anin-enqereye-38655

Çavkanî:JINHA



# [Jin ji bo keda xwe ya nedîtî têdikoşin](https://jinhaagency1.com/ku/rojane/jin-ji-bo-keda-xwe-ya-nediti-tedikosin-38662)

Jinên ku di jiyana kar de rastî cudakariya zayendî tên, ji bo zext û keda xwe ya nedîtî di qadên giştî û taybet de du qat têdikoşin.

https://jinhaagency1.com/ku/rojane/jin-ji-bo-keda-xwe-ya-nediti-tedikosin-38662

Çavkanî:JINHA




# [Samiye Kargar: Yekane çareseriya jinbûna xizaniyê şoreş e](https://jinhaagency1.com/ku/rojane/samiye-kargar-yekane-careseriya-jinbuna-xizaniye-sores-e-38680)

Samiye Kargar, diyar kir ku ji ber kapîtalîzma kûrewî di 40 salên dawî de li cîhanê guhertin tên jiyîn, diyar kir ku ev guhertin dibe sedema jinbûna xizaniyê û got ku yekane çareserî şoreş e.

https://jinhaagency1.com/ku/rojane/samiye-kargar-yekane-careseriya-jinbuna-xizaniye-sores-e-38680

Çavkanî:JINHA



## ‘Helwesta jin û civaka Êzîdî planên qirêj vale derxist’

Tevgera Azadiya Jinên Êzidî TAJÊ di derbarê pilanên PDK’ê yên li beramberî civaka Êzidî daxuyaniyek nivîskî weşandin û diyarkir ku hîn pilan û proje û êrîşên li ser civaka Êzidî bi dawî nebûne

https://jinhaagency1.com/ku/rojane/helwesta-jin-u-civaka-Ezidi-planen-qirej-vale-derxist-38679

Çavkanî:JINHA

‘

## Eniya mafê jinê û wekheviyê' wekheviya zayendê armanc dike

Rêxistinên civaka sivîl û weqfên jinan yên di qada mafê mirov û mafê jinan de xebat didin meşandin ku di ‘Eniya mafê jinê û wekheviyê’ de cih digrin hedef dikin ku jinên di her qadê de ji bo wekheviya zayendê ava bikin bi hêz bikin.

https://jinhaagency1.com/ku/rojane/eniya-mafe-jine-u-wekheviye-wekheviya-zayende-armanc-dike-38678

Çavkanî:JINHA



## 'Karkirina ji derve ji bo jinan dû qat girantir e'

Jina kedkar Nahîde Muhsîn der barê 1'ê Gulanê de got: "Sermayedar karkerên biyanî bi kêmek pere digrin, mafê me tê binpêkirin û jinên karker ji binpêkirina mafan ziyanê dibinin."

https://jinhaagency1.com/ku/civak-jiyan/jinen-karker-ji-ber-sermayedaran-du-car-dibin-qurbani-38673

Çavkanî:JINHA



## Li Îranê li ser jinan gefxarina 1'ê Gulanê

Komek jinên endamên sendîkayê yên li Îranê dijîn, ji bo îfadeyê hatin gazîkirin û ji aliyê polîsan ve hatin tehdîtkirin. Her wiha hat ragihandin ku li bajêr 3 sendîkayên karkeran hatine girtin.

https://jinhaagency1.com/ku/rojane/li-Irane-li-ser-jinan-gefxarina-1-e-gulane-38669

Çavkanî:JINHA



# [Jinên Xezayê xizmeta baş a tenduristiyê dixwazin](https://jinhaagency1.com/ku/tenduristi/jinen-xezaye-xizmeta-bas-a-tenduristiye-dixwazin-38687)

Li Xezayê ji ber kêmasiyên di xizmetên tenduristiyê de hem jinên ducanî hem jî yên nexweşên penceşêrê, bi pirsgirêkên cidî yên jiyanê re rû bi rû dimînin. Jin dixwazin xizmetên tenduristiyê baştir bin.

[https://jinhaagency1.com/ku/tenduristi/jinen-xezaye-xizmeta-bas-a-tenduristiye-dixwazin-38687](https://jinhaagency1.com/ku/tenduristi/jinen-xezaye-xizmeta-bas-a-tenduristiye-dixwazin-38687)

Çavkanî:JINHA



# [Li Îranê warzîşvanek ji aliyê hêzên hikumetê ve hate qetilkirin](https://jinhaagency1.com/ku/rojane/li-Irane-warzisvanek-ji-aliye-hezen-hikumete-ve-hate-qetilkirin-38690)

Komeleya Mafê mirovan a Kurdistanê ragihand ku çalakvana mafê mirovan, werzîşvan û çiyager Mehsa Zarin Cheng hatiye qetilkirin û cenazeye wê li qontarê çiyayekê hatiye dîtin.

[https://jinhaagency1.com/ku/rojane/li-Irane-warzisvanek-ji-aliye-hezen-hikumete-ve-hate-qetilkirin-38690](https://jinhaagency1.com/ku/rojane/li-Irane-warzisvanek-ji-aliye-hezen-hikumete-ve-hate-qetilkirin-38690)

Çavkanî:JINHA



# Çalakvana ji Rojhilatê Kurdistanê: Tiştek ku em winda bikin nîn e!

B.N ya ku beşdarî serhildana Jin Jiyan Azadî bûye û hîcaba bi zorê red dike bi nivîsa ‘Tiştek ku em winda bikin nîn e’ ya ku bi cama erebeyên jinan ve dike banga têkoşînê li jinan dike.

https://jinhaagency1.com/ku/rojane/Calakvana-ji-rojhilate-kurdistane-tistek-ku-em-winda-bikin-nin-e-38694

Çavkanî:JINHA



# Jin naxwazin bi Talîbanê re têkiliya fermî bên danîn

Aktîvîstên mafên mirovan ên civîna Dohayê nirxandin, diyar kirin ku Talîbanê li Afganîstanê bi taybetî mafên jinan û zarokên keç mafên bingehîn ên mirovan binpê dike û diyar kirin ku tê xwestin welat ber bi bêîstiqrariyê ve bê xiriqandin.

https://jinhaagency1.com/ku/rojane/jin-naxwazin-bi-talibane-re-tekiliya-fermi-ben-danin-38695

Çavkanî:JINHA



## WHO: Li Sûdanê jin û zarok di bin xetereyê de ne

Rêxistina Tenduristiyê ya Cîhanê (WHO) diyar kir ku ji ber pevçûnên li Sûdanê tên jiyîn pergala tenduristiyê ber bi karasetê ve tê kişandin û diyar kir ku jin û zarok di bin xeteriyeke mezin de ne.

https://jinhaagency1.com/ku/rojane/who-li-sudane-jin-u-zarok-di-bin-xetereye-de-ne-38696

Çavkanî:JINHA




## Ji jinên karker ên Rojhilat banga yekîtiyê

Jinên kedkar ên Rojhilatê Kurdistanê bi peyamekê daxwaza yekrêziya karkeran, jin û netewên bindest ên Îranê kir.

https://jinhaagency1.com/ku/rojane/ji-jinen-karker-en-rojhilat-banga-yekitiye-38698

Çavkanî:JINHA



## Li başûrê Kurdistanê 8 jin hat qetilkirin

NAVENDA NÛÇEYAN - Li başûrê Kurdistanê tenê di meha nîsanê de 8 jinan li herêmên cuda bi awayekî bi guman jiyana xwe ji dest dan.

http://jinnews41.xyz/kr/HEMU-NUCE/content/view/210152

Çavkanî:JINNEWS




## Li Stenbolê mîtînga jinan: Em bi hev re bi hêz in

STENBOL - Di 7'ê gulanê de li Kadikoya Stenbolê mîtînga jinan a Partiya Çep a Kesk tê lidarxistin. Siyasetmedarên jin banga tevlîbûna mîtîngê kirin û gotin: "Li dijî xespkirina destkeftiyên jinan em ê li qada mîtîngê bicivin. Em ê hêzê bidin hevdû û em ê bi hev re bi ser kevin."

http://jinnews41.xyz/kr/HEMU-NUCE/content/view/210136

Çavkanî:JINNEWS



## Jinên Silopyê: Jin dê bi dengên xwe aştî û wekheviyê bînin

ŞIRNEX - Jinên Silopyê derheqê rojeva hilbijartinê de axivîn û destnîşan kirin ku jin dê bi dengên xwe aştî û wekheviyê bînin vî welatî.

http://jinnews41.xyz/kr/HEMU-NUCE/content/view/210134

Çavkanî:JINNEWS




## 3'yê Gulana 2017'an: Platforma Rojnamegerên Jin a Mezopotamyayê ava bû

Di 3'yê gulana 2017'an de Platforma Rojnamegerên Jin a Mezopotamyayê avakirina xwe îlan kir. Jinên rojnameger ji bo bi têkoşîna rêxistinkirî ji bo li dijî zihniyeta mêr, zextên dewletê bibin bersiv hatin gel hevdu û Platforma Rojnamegerên Jin a Mezopotamyayê ava kirin. Platform binpêkirina mafên rojnamegerên jin dike rapor û alîkariyên hiqûqî dike.

http://jinnews41.xyz/kr/HEMU-NUCE/content/view/210128

Çavkanî:JINNEWS



## Li Îzmîrê jinek hat qetilkirin

ÎZMÎR - Li Karşiyakayê mêrê bi navê Yildiray Z.  jina bi navê Sultan Kaya qetil kir.

http://jinnews41.xyz/kr/HEMU-NUCE/content/view/210115

Çavkanî:JINNEWS




## MKGP 6 salî ye: Wê li dijî êrişan rêxistinbûyina jinê xurtir bibe

AMED - MKGP a ku rihê piştevaniya jinên rojnameger pêş dixe û li dijî medyaya bi zihniyeta baviksalarî tê birêvebirin, li berxwe dide dikeve 6 saliya xwe. Berdevka platformê Roza Metîna bal kişand ser têkoşîna jinên rojnameger a li qadan û got:"Em ê li dijî zext û zordestiyê rêxistinbûyina xwe bêtir xurt bikin."

http://jinnews41.xyz/kr/HEMU-NUCE/content/view/210074

Çavkanî:JINNEWS



## Duaa Dehlan: Dive zewaca bi zorê suc were hesibandin

Pispora Xizmeta Civakî Doaa Dahlan amaje bi wê yekê kir ku jin û zarokên keç yên ku li Xezzeyê bi zorê hatine zewicandin bi gelek pirsgirêkan jiyan dikin û bi taybet tundûtûjiyê re rû bi rû ne.

https://jinhaagency1.com/ku/civak-jiyan/duaa-dehlan-dive-zewaca-bi-zore-suc-were-hesibandin-38702

Çavkanî:JINHA



## Li Îranê her diçe ji ber desteserkirina keda jinan xizanî girantir dibe

Jinên karker li Îranê bi cudakariya zayendî re rû bi rû ne û di jîngeha kar de bi mêran re xwedî mafên wekhev nîn in.

https://jinhaagency1.com/ku/rojane/li-Irane-her-dice-ji-ber-desteserkirina-keda-jinan-xizani-girantir-dibe-38708

Çavkanî:JINHA



## [Jin li hemberî ezmûnên kargeriyê bi bertek in](https://jinhaagency1.com/ku/rojane/jin-li-hemberi-ezmunen-kargeriye-bi-bertek-in-38709)

Jinên Rojhilatê Kurdistanê yên li ser rêjeya zêde ya bêkariyê û zehmetkirina ezmûnên kargeriyê axivîn bi gotina, “Şansê girtina karan tenê ji bo hinek kesên alîgêrê partiyên hikumetê derbasdar e” bertek nîşanî rewşê dan.

https://jinhaagency1.com/ku/rojane/jin-li-hemberi-ezmunen-kargeriye-bi-bertek-in-38709

Çavkanî:JINHA



## [Li Misrê xebatên saziyên jinan rastî astengiya burokrasiyê tên](https://jinhaagency1.com/ku/civak-jiyan/li-misre-xebaten-saziyen-jinan-rasti-astengiya-burokrasiye-ten-38712)

Dozger û Seroka Lijneya Rêveber a Weqfa Pêşketinê ya Qahîreyê Întîsar El- Saîd diyar kir ku ji ber astengiyên burokratîk xebatên komeleyên jinan bi pêş nakeve û xwest ev astengî rabin.

https://jinhaagency1.com/ku/civak-jiyan/li-misre-xebaten-saziyen-jinan-rasti-astengiya-burokrasiye-ten-38712

Çavkanî:JINHA



## Li Îranê ji ber cezayê ‘hîcaba bi zorê’ gelek kargeh hatin girtin

Li 4 bajarên Îranê 14 kargeh bi hinceta ku quralê ‘hîcaba bi zorê’ bi cih neanîne hatin girtin.

https://jinhaagency1.com/ku/rojane/li-Irane-ji-ber-cezaye-hicaba-bi-zore-gelek-kargeh-hatin-girtin-38710

Çavkanî:JINHA



## Namzetên yekem ên jin ên Behrareş di Partiya Çep a Kesk de ne

STENBOL - Li Rîze û Artvînê Partiya Çep a Kesk di rêza yekemîn de namzetên jin nîşan da. Gel eleqeyek mezin nîşanê namzetan dan. Namzetan wiha got: “Divê em li dora Partiya Çep a Kesk kom bibin. Ji bo jiyanek wekhev û azad zêdetir jin zêdetir jiyan. Em ê AKP’ê bişînin. Em jin wê aştiyê bînin welat.”

http://jinnews41.xyz/kr/HEMU-NUCE/content/view/210204

Çavkanî:JINNEWS



## Dayika Aştiyê ya ku polîs pişta wê şikand: Ez şûnde gavê navêjim

STENBOL - Dayika Aştiyê Behiye Duman di çalakiya ji bo jin û zarokên mexdûrên erdhejê di 1'ê Adarê de pêk hatibû de, polîsan lê îşkence kir û ji du cihan pişta wê şikandin. Behiyeyê diyar kir ku wê gilî bike û got li dijî êrîşan wê şûnde gavê navêje.

http://jinnews41.xyz/kr/HEMU-NUCE/content/view/210200

Çavkanî:JINNEWS



## Jinên ji Cizîrê piştgirî dan namzetên Partiya Çepên Kesk

Jinên ji herêma Cizîrê piştgiriya xwe ji namzetên Partiya Çepên Kesk re di hilbijartinên Tirkiyeyê de nîşan da û got Partiya Çepên Kesk partiya herî guncaw ji bo armanc û têkoşîna jinan e û bang li jinên Bakurê Kurdistan û Tirkiyeyê kir ku berê xwe bidin ser sendoqên hilbijartinan.

https://www.hawarnews.com/kr/haber/jinn-ji-cizr-pistgir-dan-namzetn-partiya-cepn-kesk-h74060.html

Çavkanî:ANHA



## Wezareteke çawa ya Jin û Wekheviyê tê xwestin!

Ji damezrînerên Komeleya Wekhevî û Piştevaniyê ya SES'ê Gulseren Onanç, der barê daxwaza avabûna Wezareta Jin û Wekheviyê de, got: “Em ne qala wezareteke ku bi siyasetmedarên Enqereyê re kar dike, ya ku bi tevgera jinê re dixebite dikin.”

https://jinhaagency1.com/ku/rojane/wezareteke-cawa-ya-jin-u-wekheviye-te-xwestin-38722

Çavkanî:JINHA




## Giya bi destê dayîkên Mexmûrê dibe dermanên xwezayî

Dayikên Wargeha Penaberan a Şehîd Rustem Cûdî giya kom dikin, hişk dikin û ji bo dermanên xwezayî bi kar tînin. Xatûn Demîr jî yek ji wan jinan e ku bi destê xwe giyayan vediguherîne dermanên xwezayî.

https://jinhaagency1.com/ku/civak-jiyan/giya-bi-deste-dayiken-mexmure-dibe-dermanen-xwezayi-38720

Çavkanî:JINHA



## Li herêma Helebçeyê festîvalên werza biharê

Her sal li herêma Helepçeyê bi hatina werza biharê re gelek festîvalên berhemên karên dest û xwarinên Kurdewarî tên lidarxistin û gelek jin ji bo nasandina berhemên xwe beşdar dibin hewl didin bi vê yekê dahata jiyana xwe bikin.

https://jinhaagency1.com/ku/rojane/li-herema-helebceye-festivalen-werza-bihare-38724

Çavkanî:JINHA



## Li Şerîda Xezayê ji bo jinan xebat didomin

Divê keda jinan û rêxistinên hawarçûnê bi awayekî giştî û temamker xizmeta jinên paşguhxistî bikin ji bo ku hawirdoreke bi ewle û jiyanek bi rûmet bijîn.

https://jinhaagency1.com/ku/civak-jiyan/li-Serida-xezaye-ji-bo-jinan-xebat-didomin-38725

Çavkanî:JINHA



## Ji ber hîcaba ferzkirî ji bo îfadeyê bang li hunermendan kirin

4 jê jin in 5 hunermendên sînemayê bi hinceta piştgirî dane serhildanê û qedexeya hicaba ferzkirî binpê kirine Dozgeriya Tahranê ji bo îfadeyê gazî wan kir.

https://jinhaagency1.com/ku/rojane/ji-ber-hicaba-ferzkiri-ji-bo-ifadeye-bang-li-hunermendan-kirin-38726

Çavkanî:JINHA



## Di çapemeniya Afganistanê de hebûna jinan ji sedî 64 kêm bûye

Yekitiya rojnamegerên Navneteweyî ya Afganistanê ragihand ku piştî Talîbanê rêvaberiya Afganistanê desteser kir hebûna çapemeniyê li gorî du salên berê ji sedî 64 kêm bûye.

https://jinhaagency1.com/ku/rojane/di-capemeniya-afganistane-de-hebuna-jinan-ji-sedi-64-kem-buye-38728

Çavkanî:JINHA



## Ezgî Mola ji bo hilbijartinê bang li jinan kir

Lîstikvan Ezgî Mola bang li jinan kir wiha got: "Ez feraseta ku jinan di wesayîda hilbijartinê de jî nîşan nade û her roj hewl dide tundiya li dijî wan rewa bike, naxwazim. Divê em hemû di hilbijartinê de van tiştan bifikirin.”

https://jinhaagency1.com/ku/rojane/ezgi-mola-ji-bo-hilbijartine-bang-li-jinan-kir-38729

Çavkanî:JINHA



## Halîse Aksoy: Serî li ber van netewînin

Halîse Aksoy a ku bi wêneyê cenazeyê kurê xwe yê ku bi kargoyê girtibû di bîra gelek kesan de ye, di 28'ê Nîsanê de bi keça xwe re hat girtin, peyam şand û got ku ew ê serî li ber van netewînin.

https://jinhaagency1.com/ku/rojane/halise-aksoy-seri-li-ber-van-netewinin-38733

Çavkanî:JINHA



## KCDP: Di meha Nîsanê de 21 jin hatin qetilkirin

Li gorî daneyên “Platforma em ê cînayetên jinan bisekinînin” li Tirkiyeyê di meha Nîsanê de 21 jin ji aliyê mêran ve hatin qetilkirin.

https://jinhaagency1.com/ku/rojane/kcdp-di-meha-nisane-de-21-jin-hatin-qetilkirin-38734

Çavkanî:JINHA




## Dayikên Şemiyê tên darizandin

STENBOL - Derbarê Dayikên Şemiyê de bi hinceta "Li dij qanûnê civîn û meş pêk anîne" doz hat vekirin û danişîna yekem îro hat dîtin.

http://jinnews41.xyz/kr/HEMU-NUCE/content/view/210246

Çavkanî:JINHA



## Çareseriya Cinsiyetparêziyê Çi Ye?

Di têkiliya jin û mêr de gelek kêm û kurtî hene, ev kêm û kurtî bi kesan re sînordar nemaye û giştî bûye. Para cinsiyetparêziyê di vê yekê de çi ye? Em ê çawa li hemberî cinsiyetparêziyê têbikoşin û bi kîjan rê û rêbazî xwe ji cinsiyetparêziyê rizgar bikin?

https://ronahi.net/ku/?p=55569

Çavkanî:ROJNAMEYA RONAHÎ




## Kovara YPJ Star bi hejmara 89`an derket pêş xwîneran

Kovara YPJ STAR a hejmara 89. ya Gulana 2023 bi çar serenavên sereke derket, ew jî ev in: ‘Em ê bi bîranînên şehîdan ve girêdayî bin’ , Sozdariya Gulîsora’, ‘Mirov bi kedê dibe hebûn’ û ‘Etîk û Estetîk’.

https://ronahi.tv/archives/201913

Çavkanî:RONAHÎ



## Talîbanê nahêle bijîjkên jin bikevin azmûna pisporiyê

Talîbanê ragihand ku dê destûr nede ketina bijîşkên jin a ji bo ezmûna temamkirina pisporiyê û ji bo kadroyên pisporiyê ya ji nexweşxaneyan re dê mêr werin girtin.

https://jinhaagency1.com/ku/rojane/talibane-nahele-bijijken-jin-bikevin-azmuna-pisporiye-38750

Çavkanî:JINHA



## Narges Mohammadi: Komara Îranê dijminê jinan e

Çalakvana mafên mirovan û girtiya siyasî ya li girtîgeha Evînê Narges Mohammadi bi peyamekê ragihand ku rojnamevan û çalakvanên mafên mirovan li Îranê ji ber ronahîkirina rastiyan û îfadekirina ramanê xwe di bin metirsiyê de ne.

https://jinhaagency1.com/ku/rojane/narges-mohammadi-komara-Irane-dijmine-jinan-e-38747

Çavkanî:JINHA



## Pirsgirêka wesayetê ya jinên Misirî: Divê zagonên nû derbikevin

Parêzer diyar dikin ku li Misirê piştî wefata bav, wesayeta malî ya zarokan didin bapîr û hemû berpirsyariyên din jî dikevin ser milên dayikê û gotin ku ji bo jin mexdûr nebin divê zagonên nû derbikevin.

https://jinhaagency1.com/ku/hiq%C3%BBq/pirsgireka-wesayete-ya-jinen-misiri-dive-zagonen-nu-derbikevin-38742

Çavkanî:JINHA



## KCDP: Meha Nîsanê li Tirkiyeyê 21 jin ji aliyê mêran ve hatin qetilkirin

Li gorî rapora Nîsanê ya KCDP'ê, li Tirkiyeyê 21 jin hatin qetilkirin, 23 jin jî bi guman jiyana xwe ji dest dane.

https://anfkurdi.com/jin/kcdp-meha-nisane-li-tirkiyeye-21-jin-ji-aliye-meran-ve-hatin-qetilkirin-169432

Çavkanî:ANF



Nûçeyên herêmî

## Li Kobanê pêşangeha karê destan

Weqfa Jina Azad li bajarê Kobanê pêşangeha karê destan vekir. Dê pêşangeh du rojan dewam bike.

https://www.hawarnews.com/kr/haber/li-koban-psangeha-kar-destan-h73974.html

Çavkanî:ANHA



## Yekitiya Kedkaran: Jinên kedkar roleke girîng dilîzin

Jinên kedkar ên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê roleke girîng di her qadên jiyanê de dilîzin, di wê çarçoveyê de hevseroka Yekitiya Kedkaran Şehnaz Mehmê destnîşan kir ku yekitî hewl dide kedkaran li gor hevpeymana civakî bi rêxistin bike.

https://www.hawarnews.com/kr/haber/yekitiya-kedkaran-jinn-kedkar-roleke-girng-dilzin-h73985.html

Çavkanî:ANHA:



## Avakirina şoreşê bi keda jinê tê hûnandin

Jinên cotkar ên di pêvajoya hilberîna çandiniyê de li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê bang li hemû jinan dikin ku di avakirina şoreşê de bibin perçeyek ji vê hilberînê.

https://jinhaagency1.com/ku/rojane/avakirina-sorese-bi-keda-jine-te-hunandin-38667

Çavkanî:JINHA



## ’Li Hemberî Qirkirina Xwezayê Em Têkoşînê Dikin”

Karkerên Jin yên meştilgiha Şehîd Barîn a Giştî ya li bajarê Qamişlo, diyar kirin ku ew bi karê xwe yê di meştelgehê de hewl didin ku li dijî qirkirina xwezayê bisekinin û xwezaya herêmê ji nû ve zindî bikin.

https://ronahi.net/ku/?p=55594

Çavkanî:RONAHÎ



## Weqfa Jina Azad ji bo guhertina jiyana jinan dixebite

Weqfa Jina Azad bi xebatên xwe hewl dide civakê di hemû warên jiyanî de bi pêş bixe her wiha jinên di kampên penaberan de jî perwerde dike.

https://jinhaagency1.com/ku/civak-jiyan/weqfa-jina-azad-ji-bo-guhertina-jiyana-jinan-dixebite-38738

Çavkanî:JINHA



**Kongra star**
**6/5/2023**